

ئەگەر پىماناۋايىت ، ۋەلامەكانى ئېمە ئەۋاۋ و دوا دەركى مۇۋاپىقەتتىن ، ئەۋا خەرىكىن لە خۇمان بىتىك سازدەكەين . ھەرۋەھا ئەگەر پىماناۋايىت ، ئەۋا سىستەمى رېنكخستنى كۆمەلگە ، كە ئېمە خەباتى بۇ دەكەين ، دوايىن چاۋەرۋانى و گەشەيەكە ، كە مۇۋاپىقەتتى پىدەگات ، ئەۋا دىسانەۋە خەرىكىن پوۋچگەرايەكى دى لە تەپۋتۇزى پۇۋچگەرايەكانى دىكە ، چىدەكەينەۋە . سۇشالېزىم بەھەشتىك نىيە لە ئاسمانەكانەۋە داىگرىن و لە پەراۋى ئەفسانەكاندا بېدۇزىنەۋە و مۇدۇرئىزەي بەكەين ، سۇشالېزىم خەۋنى مۇۋى زىندوۋە و بە پراكتىكى شۇرېشگىرئانە كەتۋارى دەپتەۋە و سەرۋەتئىشى لە كۆلتوربوۋىندا دەپت ، بەئى ئەۋە ، لە خەيالى گۆشەگىرئانە و فەنتازى ئابدالېستانە بەۋلاۋەتر نابىت . ھەزىن

بەشى يازدەھەم

باشە كە تۆ فىدرايەتتى ئىستاي ھەرىمى كوردستان رەتدەكەيتەۋە ، لەۋلاشەۋە دەۋلەتتى سىكىۋىلار و سەربەخۇى حزىي كۆمۇنىستى كرىكارى رەتدەكەيتەۋە ، باۋەرپىشت بە ۋلايەتتى ئىسلامىش نىيە ، ئەدى چ ئەلئەرناتىقئىك ھەيە ، كە ئىدىيەي بەكى ؟

... رىق نەچەن رىق ھەرىتىشنا ، مەلئە، نانتىقئىك ھەنت ئەۋرەۋ ، نگر بۇ جنخستىل : ھەن : بەكەم ياگەندە و ھوشياركردنەۋە و پراكتىزەكردن لە خوارەۋەرا بە بەكگرتن و ھەنگاۋى كردەيى ژۇدەستان ، دوۋم سەپاندىن لە سەرەۋەرا ، بە پىراى رامباران و سەۋدا و سازنى دەسەلاتخۋازان . پىش ئەۋە لە پىشئىارەكەي خۇم بدوئىم ، باشترە نەۋنە بۇ ھەر دوۋ بارەكە بېئىنەۋە ، كە من لىردەدا كۆلخۇزەكانى روسىيە ساپەي بۆلشەفېزىم و ھەرەۋەزىيەكانى ئۇكرانىا - ۋ ھەرەۋەزىيەكانى سەردەمى جەنگى نېۋخۇى ئىسپانیا - ۱۹۱۰ ، بەراۋرددەكەم :

لە روسىيەنى پاش راپەرىنى سالى ۱۹۱۷ بۆلشەفېكەكان ھەۋلىاندا ئۆلگۈى خۇيان بۇ كىلگەي سۇشالېستى بەزۇر سەپىنن ، لەۋ بارەۋە سەرجاۋە و دۆكۈمىنتە مېژۋىيەكان كارەساتى بېۋىنەي مېژۋىيە لە زۇردارى و ملھورى پارتى بۆلشەفېك و ناامادەيى خەلك و مردنى چەندان مليۋنى و بېبەرەھەمى ئەۋ ھەۋلە دەگېرنەۋە ، كە بەرادەيەك جوتبارانى روسىيە توۋشى كارەسات بوون ، كە بارى ژيان و بەرەھە ، و گوزەرانىان لە سەردەمى پاشابەتتى [تۋزى] و جەنگى نېۋخۇ خراپتر بوو و رادەي بەرەھەمپىتان دابەزىبوو و گرانى و نەمەن ئال رىيەسەي گەندەكانزا كىناشە ، لىرودا يۋا ، لىيىتېكردن رىق ئەۋا ، مەراۋە ، كەمە ، لەبە، ئەۋە خۇم لەۋ كارە لادەدەم ، ئەگەر گومانەت لەمە ھەيە ، تىكايە لە ۋەلامى ئەم ۋەلامەدا ، ئاگادارمبەكەرەۋە تا نەۋنەگەلىكى زۇرى بەلگەدار ، لە دەمى رەخەنگرانى كۆمۇنىستەۋە ، بخەمەرۋو .

لە بەرانبەردا ھەرەۋەزىيەكانى ئۇكرانىا ۱۹۱۱-۱۹۲۱ كە لەلەيەك لەلەيەن لەشكرى نەمسا و ئالمانىاۋە ھېرشىان دەكرابە سەر و ھاۋكات لە پىشتەۋەرا لەلەيەن لەشكردى سوۋرەۋە ھېرشىان دەكرابە سەر ، ھەرۋەھا ھەرەۋەزىيەكانى ئىسپانیا لە راپەرىنى سى جەنگى نېۋخۇى ئىسپانادا ، كە لەلەيەك فرانسۇ خۇى بۇ ھېرش ئامادەدەكرد و لەلەيەكى دېكەۋە كۆمۇنىستە پىرۇ-روسەكان رېگرىيان لە ھەر ھەۋل و ئۆلگۈيەكى ئازادىخۋازنە دەكرد ، كە چى بە پىچەۋانەي ئەزمونى سەركۈتگەرانى بۆلشەفېكەكانەۋە ، ھەرەۋەزىيە ئازادەكان ھەم لەلەيەن جوتباران و كرىكارانەۋە پىشۋازىيەكى فراۋانى جەماۋەرىيان لى دەكرا و ھەم بەرەھەم و سەركەۋتوۋىيان بەراۋرد بە ناۋچەكانى دىكە زىياتر و بەرجاۋبوو . بەلئ سەركەۋتن و بەرەسەندىيان بەرادەيەك رى ، كاتىك كە خاۋەنى كىلگە گەۋرەكان و كارگە و كارخانەكان بە سەركەۋتنى لەشكرى فرانسۇ گەپانەۋە ، ھەم كىلگە و كارگەكان ئاۋەدان بوون و ھەم بىرى بەرەھەمپىتان زىادىكردبوو . ئەمە پەرجوۋى كار و يەكىتتى و ھەرەۋەزىي ئازاد بوو ، كەتۋار و راستىيەك ، كە بۆلشەفېكەكان نىو سەدە بە ھەموو جۇرئەك ھەۋلى شاردنەۋە و شىۋاندىيان دا!

ئەۋ جىاۋازىيە لە سەرەنجامدا تەنيا بۇ يەك ھۆ دەگەپتەۋە ، ئەۋىش ئازادى ۋىست (ئىرادە)نى تاك و كۆمۇنىستىيەكانە ، كە لە بارى يەكەمدا [روسىاي بۆلشەفېكى] جوتباران بەزۇر ناچار بەبەشدارى دەكران و زۇرىنەي بەرەھەمپان لەلەيەن باجگرانى پارتى پىشەرە و سىخۋرانى (چىكا) بە زەۋتدەكرا و ئەۋى ئامادەي بەشدارى كۆلخۇزەكان نەبوۋايە ، ئەۋا بۇ سىنا بە ئىۋدوۋەگىر : ئۆرەملىزىيەكاي دىكە دەگەن ، اۋەۋو . بۇلام لە ھەمەن پەرىئەنا ، كىيەكان ئۇكرانىا و رىسپانادا ، ھە ، كەس : ئازادىۋر بەشدارىيىكات نا ، لەتەك ئەۋەشدا ئەۋ رەكەسە . كە پىشدا ، نەكردانە رەل كىتات . سالترا نەھەم ، كېۋر يەمانە ، لەلەيە ، رىمىتلىان رىتە ھەرەۋەزىيەكانەۋە ، دەستىگىرۋى دەكرا و زىيانى ۋەك كۆمەكى كۆمەلەيەتتى دابىندەكرا . ھەر ئەم خالە ۋاى لە جوتباران كرد ، كە گرنكى و سەركەۋتوۋىي ھەرەۋەزىيەكان دەركىكەن و بە ھارىكارى و بە چەك پارىزگارپىيان لى بگەن و لەۋ پىناۋەشدا بەرانبەر لەشكرى فرانسۇ ، لەپىناۋ ئازادى و يەكسانى دەسەلات و سەربەخۇى ئابوۋرىي و دادپەرۋەرىي كۆمەلەيەتتىدا گەۋرەترىن قوربانى .

ھەلئەتە ئەم خەدەھەشنا ، بىر ئامادەيەچىنەتەيە لە شىۋە : ئەكدا رىۋو . بەلئەۋرە ھە نەۋمە تېرەتە . كۆمۇلەنەت رە بەشئىك لە كۆلتورى خەلئەكە . ئەۋەكى بە بۇ ۋلامەكى من رى رى گىنگە ، ھە ، ئەم خالەيە ۋەمەۋرەپىلئىر ، شىۋە : پىۋستىر . بەردەۋر . مەۋەسە رەمەھە . خالئەلرەپىرەپىنسا پىۋىستى بە كارى ھوشيارىبەخىش و ياگە دەي شۇرېشگىرئانە ھەيە ، ھەر ئەۋەكى كە ئىناركىيەكان لە كۆتابى سەدەي نۆۋدەۋە تا سالى ۱۹۱۰ لە ئىسپانیا ، شەۋ و پۇز بەردەۋام لەئىۋ كارگەكان و كىلگەكاندا كارپان بۇ كردبوو و بوۋبوۋە بەشئىك لە ھوشيارى و تەنەتە ئاۋەز و كۆلتورى خەلك .

ھە ، لەبە، ئەۋەم ، ئەگە ، ئىبەش [ھاھەسە ، دەمەن] ئەم ساتە [بەرە ، كا ، ئىك] چى بېكىتە . انى . پى . ئارمىكى جەماۋەرىي بىت يا بەرپاكردى راپىسەك [رېفراندۆمىك] يا ھەلخراندى راپە ، پىنك . لى ، نكخستتەۋە . كۆمەلگە لەسە ، شىۋە : ئىك رە . جنخستى ئەلئە ، ناتىقئىك ، ئەۋا پىۋىستىل . بە ياگەندە و ھوشياركردنەۋەي بەردەۋام ھەيە ، ۋەك پىشەرجى دەستبەكاربوون . چونكە سەرگرتن و چىكەۋتەبوۋى دىاردەيەك ، پىۋىستى بە بوون بە بەشئىك لە كۆلتور و ئاۋەزى تاك و كۆمەلگە بەگشتى ھەيە ، ئەگەر نا ، يا ئەۋە رى ئەزمونى چەپەكان لە عىراق و كوردستان نىشانىدەدات ، دەپت خۇزگە بە پەرجوۋى ئاسمانى بخۋازىن بۇ ھاتەندى يا ئەۋەتا ۋەك بۆلشەفېكەكان بە كوشتن و زىندان و ھەرەشى دوۋر خستەنەۋە دەيسەپىنن .

چ عىراق بەگشتى چ ھەرىمى كوردستان ، لە كۆمەلئىك ئىتتى و ئايىن و كۆلتورى جىاۋاز پىكەتتوۋە ، لە كۆتابى سەدەي نۆۋدەۋە بەگشتى و لە پاش داگىركردنى عىراق لەلەيەن داگىركارىي برىتانىاۋە بىزافە ناسىۋنالىستىيەكان و پارتە رامبارىيەكان لەسەر رېنكخستنى ھەرىمەكان و ناۋچەكان لەسەر بىنەماي ئابدۇلۋەجى ناسىۋنالىستى و دروستكردى دوزمنايەتى و كىشە و جەنگ و كوشتار لەئىۋان نەتەۋەكاندا بەگشتى و ناۋچە ھاۋبەشەكاندا بەتابەتەي كاردەكەن و ئەم ھەرىمە چەند جەنگى نېۋخۇىي و دەركەي بەسەرد ھاتوۋە ، كىمباربان و جىنۇسايىدى تىداكراۋە . ھەر ئەلئەرناتىقئىك ئەم رەۋادوانە لەبەرچاۋەگرتى ، بەلئىنايەۋە ۋەك بەياننامە پارتىيەكان دەپتە راپردوۋىيەكى نەزۇك .

ۋەك دەزانىن لەئىۋ زۇربەي گروپە رامبارىيەكاندا بە چەپ و راست و نىۋەندەۋە بەك ئەلئەرناتىقئى پىشئىارە ، ئەۋىش گۇرانى ۋالەتتى [رامبارىي] يا گۇران لە دەسەلاتى رامبارى . كە ھەر گروپ و ئاراستەيەكى رامبارىي خۇى بە بىشترىن كاندىد بۇ جىگرتەۋەي سەۋەرانى ئى تا دەپنەت ، گشت دەسەلاتخۋازان بەك بەپاميان بۇ جەماۋەرىك كە دەپانەۋىت

karesatî bêwêney mêjûyî le zordarî û milhurî partî bolşevîk û naamadeyî xellk û mirdnî çendan milyoni û bêberhemî ew hewlle degêrnewe, ke berradeyek cutyaranî rusye tûşî karesat bûn, ke barî jyan û berehem û guzeranyan le serdemî paşayeti [tzarî] û cengî nêwxo xraptir bû û radey berhemhênan dabezîbû û granî û nebûnî ballî beser gundekanda kêşabû, lêreda bwarî listkirdnî ew ew amar û drawane, keme, leberewe xom lew kare ladedem, eger gumant leme heye, tkaye le wellamî em wellameda, agadarimbkerewe ta nmûnegelêkî zorî bellgedar, le demî rexnegranî komunîstewe, bxemerrû.

Le beranberda herewezîyekanî okranya 1917-1921 ke lelayek lelayen leşkirî nemsâ û allmanyawe hêrsyan dekraye ser û hawkat le piştewerra lelaeyn leşkirdî sûrewe hêrsyan dekraye ser, herweha herewezîyekanî îspanya le raperrîni 1936î "cengî nêwxyoi" îspanyada, ke lelayek franko xoy bo hêrs amadedekrid û lelayekî dîkewe komunîste prro-rusekan rêgrîyan le her hewll û olguyekî azadîxwazane dekrîd, keçî be pêçewaney ezmûnî serkutgeranî bolşevîkekanewe, herewezîye azadekan hem lelayen cutyaran û krêkarane we pêşwazîyekî frawanî cemawerîyan lê dekra û hem berhem û serkewtûyyan berawrid be nawçekanî dîke zyatîr û berçawbû. Bellê serkewtin û peresendinyan berradeyek bû, katêk ke xawenî kêllge gewrekan û karge û karxanekan be serkewtinî leşkirî franko gerranewe, hem kêllge û kargekan awedan bûn û hem brî berhemhênan zyadîkirdbû. Eme percûy kar û yekêtî û herwezîy azad bû, ketwar û rastîyek, ke bolşevîkekan nîw sede be hemû corêk hewllî şardnewe û şêwandinyan da!

Ew cyawazîye le serencamda tenya bo yek ho degerrêtewe, ewîş azadî wîst (îrade)î tak û komîwnîtyekane, ke le barî yekemda [rusyay bolşevîkî] cutyaran bezor naçar beşdarî dekran û zorîney berhemyan lelayen bacgranî partî pêşrrew û sîxuranî (çîka)we zewtdokra û ewî amadey beşdarî kolxozekan nebuwaye, ewa bo sibîrya û urdûge zoremlêyyekanî dîke degwêzrayewe. Bellam le herewezîye enarkîyekanî okranya û îspanyada, her kes azadbû beşdarîbkat ya na, letek eweşda ew kesey ke beşdarî nekirdaye û le kotayî salda berhemî kem buwaye, lelayen cutyaranî nêw herewezîyekanewe, destîgîroyî dekra û jyanî wek komekî komellayeti dabîndekra. Her em xalle way le cutyaran kird, ke grîngî û serkewtûy herewezîyekan derkibken û be harîkarî û be çek parêzgarîyan lê bken û lew pênaşeşda beranber leşkirî franko, lepênaw azadî û yeksanî desellat û serbexoyî abûrîy û dadperwerîy komellayetiya gewretrîn qurbanîbden.

Hellbete em xudhuşyarîy û amadeyye çîneyetîye le şewrojekda serîhellnedawe û nebuwete hêzî komellayeti û beşêk le kultûrî xellkeke. Ewey ke bo wllamekey min grînge, her em xalloye û demewêt bllêm, şorrş prosêşêkî berdewamî mêjûyye û hemû xallêk lew prosêşeda pêwîstî b e karî huşyarîbexîş û pagendey şorrşîgîrane heye, her ewey ke enarkîyekan le kotayî sedey nozdewe ta sallî 1936 le îspanya, şew û roj berdewam lenêw kargekan û kêllgekanda karyan bo kirdbû û bûbuwe beşêk le huşyarî û tenanet awez û kultûrî xellk.

Her leberewe, eger êmeş [hawserdemyanî em sate] bo her karêk çî pêkhênanî rêkixrawêkî cemawerî bêt ya berpakirdnî raprisîyek [rîfrandomêk] ya hellxirrandinî raperrînek ya rêkxistnewey komellge leser şewazêk û cêxistinî ellternatîvêk, ewa pêwîstman be pagende û huşyarkirdnewey berdewam heye, wek pêşmercî destbekarbûn. Çunke sergirtin û cêkewtebûnî dyardeyek, pêwîstî be bûn be beşêk le kultûr û awezî tak û komellge begsitî heye, eger na, ya eweta wek ezmûnî çepekan le îraq û kurdistan nîşanîdedat, debêt xozge be percûy asmanî bixwazîn bo hatnedî ya eweta wek bolşevîkekan be kuştin û zîndan û herreşey dûrxistenewe deysepênî.

Çî îra qî begsitî çî herêmî kurdistan, le komellêk êtnî û ayîn û kultûrî cyawaz pêkhatuwe, le kotayî sedey nozdewe begsitî û le paş dagîrkirdnî îraq lelayen dagîrkarîy brîtanyawe bzawe nasîwnalîstîyekan û parte ramyarîyekan leser rêkxistinî herêmekan û nawçekan leser bnemay aydyolocî nasîwnalîstî û drustkirdnî dujimmayeti û kêşe û ceng û kuştar lenêwan netewekanda begsitî û nawçe hawbeşekanda betaybetî kardeken û em herême çend cengî nêwxyoi û derekî beserda hatuwe, kîmyabaran û cînosaydî têdakrawe. Her ellternatîvêk em rûdawane leberçawnegrêt, bedillnyayyewe wek beyanname partîyekan debête raburdûyekî nezok.

Wek dezanîn lenêw zorbey grupe ramyarîyekanda be çep û rast û nêwendewe yek ellternatîv pêşnyare, ewîş gorranî rwalletî [ramyarîy] ya gorran le desellatî ramyarîda, ke her grup û arasteyekî ramyarîy xoy be baştirîn kandîd bo cêgirtnewey serweranî êsta debînêt, gişt desellatixwazan yek peyamyann bo cemawerêk ke deyanewêt serwerîy beserda bken, heye, ewîş eweye "eger dway min bkeêt, beheştî asmanekkant leser zewî bo msogerdekem". Em ellternatîveş ya be beşdarî hellbjardinî parlemanî cêbecêydeken ya be kudetay serbazî û qostnewey lazarî raperrînekan. Le beranberda ew ştaney ke le hîç serdemêkî em nawçeyeda lelay grup û parte çepekan pêşnyarnebûn, rêkxistinî serbexoy cemawerîy, çalakî [xebatî] rastewxo, xoberrêweberaryeti serbexo [otonom]î komîwnîtyekan û karge û kêllge herewezîyekan, dêmkraşî rastewxo û yekgirtnewey fêdrallîstîyaney komellgekan, ke debne bnaxey rêkxistnewey komellgey azad.

Herweha be boçûnî min, her kat destipêbkeyn, pêwîste lem seretayewe destipêbkeyn û bebê em seretaye û bebê em amadekarîye, es teme le hîç hellçûn û raperrînekî şorrşîgêraneda ya le hîç qeyranêkî sermayedarîda, bitwanîn hengawêk berew allowgîrî komellayeti; bewatay têkdanî bnemay abûrîy û bûne kultûrîyekanî sistemî sermayedarî, bnêyn. Le hemû serdemekanda grîftî ewaney ke pagendey soşyalîstîbûnyan kirduwe [betaybet le sallî 1991 bedwawe] ewe buwe, ke pagendey gorranekanyan wek xewnêk bo rojanî hellçûn û qeyran hellgirtuwe û lew rojeda wîstûyane be derkirdnî rageyandinêk [beyanname] û bangewazkirdnî xellk, şorrş [be watay xoyan] berpabken.

Min nazanim key û çend dexayênêt, ta xewnekanî ême çî le jyanî xomanda û çî bo newekanî dahatû dênedî, bellam lewe dillnyam her êsta ya ew satey ke erkî

henûkeyî serşanman dekeyn, pêwîste karî bo bkeyn û ewe leberçawbigrîn, ke le dahatûda bebê kar û têkoşanî êsta, esteme serkewtin bedestibhênîn. Bo nmûne eger bmanewêt le sallî dahatûda bzûtneweyekî bêkarî behêz û serbexo ya bzûtneweyekî şwariyê cêkewteman hebêt ya le çend sallî dahatûda zincîreyek herewezî dihatekan û komoney şarîyî û komellêk xoberêweberîyî krêkarîyî karxanekan û komellêk xwêndingey serbexo û azadî xoberrêweberayeti xwêndikaran û mamostayanman hebîn, pêwîste her êsta û lem satewe pagendeyan bo bkeyn û xohuşyarî û xorrêkxistin û xoberrêweberêwêbirdin û otonomî jyan bkeyne beşêk le bernamey çalakî û têkoşanî rojaneman û hewillbdeyn byankeyn be beşêk le kultûrî jyanî rojaneman. Nek çawerrêy helbarîn le asmanewe ya ledaybûnî raberan bîn!

Wek gutim "îraq û herêmi kurdistan, fre kultûr û fre êtnî û fre ayînin, bo ewey kar û têkoşanî şorrşigêrraneman serkewtûbêt, pêwîste şêwazî "xocêy çalakîkirdin û sertaserîyî hawpiştîkirdin " bkeyne bnemay kar û çalakî û peyrrewîbkeyn. Bo emeş pêwîste pêş hemû ştêk wek seretayek û bnemayek le birrwabûnman be azadî, bawerrman be cyabûnewe û yekgirtinî nawçekan, herêmekan, êtînyekan, azadî kultûrî, azadî zman û xwêndinî zmanî dayk, he bêt.

Le hengawî duwemda her kese û le şwênî kar û jyanî xoyda, xerîkî pagende û huşyarkirdnewe bêt û le rêkixrawey pîşeyî û abûrîyî û torrî komellayeti y xocêyda xerîkî çalakî serbexoy xoy bêt. Eme dekate xoperwerdekirdin û perwerdekirdinî takî azadîxwaz û serbexo. Katêk ke twanra le astî komellgeda bzûtnewe komellayeti yekan bew araste berrêbxirên û astî huşyarî tak bgeyênrete ew astey, ke çîdî netwanrêt le jêr sayey sîstemî quçkeyî berrêwêbirdinda bji. Ew kat le amadeyî û yekêti komellayeti y fre rehendda hawsengî hêz lenêwan berey gorrnixwaz (şorrş) û berey koneparêz (dješorrş)da belay berey şorrîşda deşkêtewe û asantir detwanrêt ewe wênabkirêt, ke be mangirtinî giştî û yaxîbûnî komellayeti y berdeyam û hêzgirtinî xoberrêweberayeti yekan û kenarxistinî rollî dewllet û berrêweberan le jyanî komellayeti yda, desellatî çîneyetî derruxênrêt. Lewaneye bo ewaney ke be paşrrewîy desellatixwazan destemobûn û xuyangirtuwe, wênakirdin û birrwakirdinî weha ştêk asannebêt, bellam eger sernicî mêtîy bîst sallî raburdû bdeyn, ewa be asanî çendînmûney zîndû berçawdekewn, ke pêçewaney tîwananî paşrewane û destemoyaney ramyarîyî: le sedey raburdûda le wllatî bengladîş û herweha le wllatî lubnan, herçende bzûtnewekanî: bergirtin be taybetîkirdnewe kertekan û pêkhênanî herewezîyekan û sendnewe karxane û nêwendekanî xizmetguzarî û şwêne giştîyekan le dewllet û sermayedaran le aradanebûn û rêkxistnewe komellayeti y berhemhênan û xoberrêweberayeti y gelîy bûnyannebû, bellam wêray eweş çend car fermandarîy (hkumetî) ew dû wllate behoy mangirtinî giştî û sertaserîyewe twanrawe brruxêndirên û hellweşêndirênewe. Herweha le mangî cunî 2010- 2011 wllatî belçîka behoy kêşey nêwan lîste brawekanî hellbjardnewe, bebê fermandarîy mayewe û wek wllatî bebê fermandarîy, rîkordî çîhanî şkand û hemû karubarekanî komellge û guzeranî jyanî rojane û rotîy berrêwedeçû û bebê ewey ew bêserewbereyê drustîbbêt, ke ramyarekan bewe kesanî nahuşyar û birrwabexonebû detrisênin; "eger şwaneyî dewllet û fermandarîy serûxellkî nebêt, jyan naguzerêt". Hellbete pêş ew hengawane û paş eweş, pêwîste mafî birryardan û raprisîyî leser pîrse komellayeti y abûrîyekan, leberçawgîrabêt û her nawçe û herêmek ya gund û şarêk leser birryardanî giştî herewezîyekan û şurakan û rêkixrawe cemawerîyekanî, bepêy bnemakanî dêmokratî rastewxo, mafî cyabûnewe ya yekgirtin ya çonyetî rêkxistinî jyan û xoberrêwêbirdinî xoy hebêt.

Bew core detwanî ber be xwênriştin û cengî labelayî nêwan nawçekan û êtnîyekan û ayînekan û kultûre cyawazekan bigrîn û le destebekirdinî azadî û serbexoyî hemuwanda gyanî tebayî û hawpiştî û pêkeweyjan behêz bkeyn; wate nasênralizekirdinî berrêweberayeti y şêwey jyan û rêkxistinî komîwnîtiyekan; wate gêrranewe birryardan û berrêweberayeti y bo xudî xellk [gişt endamanî komellge], eger na her hewllêkî ramyarîy le nziktirîn wêstgeyda, serî le birokrasî û tiokrasîyewe dedeçêtewe !

Bellam lebirman neçêt, ke destbekarbûn bo pêkhênanî herewezîyekan û xoberrêweberayeti y karxane û kèllge û xwêndingey û fermange û şarewanîyekan û bûnî rêkixrawe serbexo cemawerîyekan wek berdî bnaxey komellge azadekan, yekemîn hengawî destbekarbûne be amancî gorrîni sîstemî çîneyetî. Herweha perwerdekirdinî birrwabexobûnî takekes û serbexoyî le desellatî serwerî û partekan û baykotî ramyarkaran û mşexoran le jyanî komellayeti yda, mercî serbexoyî nêwendekanî xebate.

[Ta ewendey min bîstîbêtim enarşîstekan bawerrîyan be şorrş nye, ey to çi dellêyt?](#)

Eger wellameke kurtîbkemewe, ewa emey lê derdeçêt; enarkîstekan bawerrîyan be şorrşî komellayeti y heye û hîç allugêrêkî ramyarîy û serûxellkî be şorrş nanan û qonaxbendîş bo şorrîş naken û rastewxo xoyan le şorrşî komellayeti yda debînnewe, hellbete şorrîş bew watayey ke enarkîstekan mebestîyane nek bewatay serkewtinî partêk le hellbjardinî parlemanîda ya kudetayekî serbazî û bedesellatgeyîştinî partêk le şkîstî raperrînekda benawî prrollîtarîyawe, ya hellçûnêkî satekî narrazîyanî komellge û gorrîni serwerêk be serwerêkî dîke, gorrîni dîktatorrêkî serbazîyê be dîktatorrêkî parîlmanî, gorrîni tiokrasî be heray parlemanî, gorrîni faşîzmî ayîni be faşîzmî sêkîwlar. Şorrş rewî gorrani komellayeti yaney komellgey çîneyetîyê berew komellgey naçîneyetî, weha prosêsêkî mêtîyî tewaw pêçewaney allugorre ramyarîy û rwalletîyekan, gorrîni komellgeyê be gorrîni rîşeyî bnema û rêkxistne abûrîyî û kultûrîyî û pêkhatyeyekanî!

Le rwangey mnewe, şorrş rûdawêkî ktupîr û katîy nîye, fukirdinî partêk û raberayeti y partaêk nîye be cuqeyekî leşkirîyda, bellku prrosêsêkî mêtîyîyê û lewete y çewsanewe heye, ewîş berdeyame û hêsta le hîç şwênêkî goy zemînda serkewtinî yekcarekî bedestnehênawe, ew rûdawe mêtîyîyaney ke be "şorrş" nawbrawn û nawdebrên, le raperrî û hellçûnî satekî şorrşigêrrane bewlawetir nîn. Şorrş wate gorrani komellayeti y, ke le bwarî abûrîyda dekate gorrani

peywendîyekani berhemhênan û komellayetyîkirdnewey kertekani berhemhênan û lenêwbirdni payekani sistemî çinayeti [karîkrêgirte û darayî taybet], le bwarî berrêwebirdni komellgeda dekate hellweşandnewey sistemî ramyarîyî û komellayetyîkirdnewey pirse komellayetyî berramyarîykrawekan û rêkxistnewey komellgekan û tewawî cîhan Leser bnemay yekgirtni fêdralistîyaney azad û piştbestû be hawpiştî û tebayî û pêkeweyjani mrov û bûnewerekanî dîke.

Be boçûnî min, xudî rewî geşey komellgey çinayeti, le henawî xoyda hellgiri arastey şorrş û djeşorrşe, bellgekan û derkewtekan û locîkî derkewtin û têdaçûnî dyarde komellayetyîkan, selmênerî bûn û berdewamî mlimlanêy nêwan şorrş û djeşorrşin, her le berebeyani komellgey mroyewe ta henûke. Eger berawridî sereta û êstay dyardekan bkeyn, ewa locîkî berdewamî şorrîşman le jyanî rojaneda bo derdekewêt; bo nmûne tundutîjî û kuştar lenêw eşkewtinşinan û êsta, şêwey pêkeweyjani spîpêst û reşpêst pêş 100 sall û êsta, goştxorî û ajellkujî caran û êsta, rêwşiwêni jnan, caran û êsta zor şti dîke, debînin, sererray hewllekanî serweran bo modêrnîzekirdni drrindayeti huşyaraney mrov behoy twanay teknolocî û sertapagîrî sistemekewe, hêsta hoşyarî û piştêkirdni takekan le ceng û nejadpersitî û demargîrî ayîni û êtniyî û regezîyî, rû le pêşe û bazarî drrindeyî le çaw caran rû le kziye. Bo min emane dyardey şorrşin û gewahî bo berdewamî şorrş deden.

Bepêçewaney birî baw û zall, hiç yek le gorranekekanî sistemekan [koylayeti be derebegayeti be sermayedarî] her le ewey pêydellên "şorrşî koylan", "şorrşî gewrey ferense" ta "şorrşî komune" û ta "şorrşî oktoberî 1917" û "şorrşî 1936î îspanya" û "şorrşî 1979î êran" û azarî 1991î kurdistan, şorrş nebûn, bellku tenya bazneyek û hengawêk bûn le rewî şorrîşda, şorrşêk ke ta jyan hebêt, berdewam debêt û ruxan û drustibûnî hiç sistemêkî komellayeti natwanêt kotayî ew bêt. Ew rûdawane û hezaran rûdawî dîkey nenasraw û şêwênrawî dîke, tenya hellçûn û teqînewey xêray şepolekanî şorrş bûn û letek têkişkanî raperrîne cemawerîyekanda, djeşorrş serkewtinî bedestihênawe, le sallanî nêwan 1779 – 1793 - 1848 le têkişkanî berey cemawerîy çewsawanda [cutyaran û krêkarani şariy], borcwazî ferensî wek djeşorrş û pawangerî xwastekani şorrş, serkewtinî bedestihêna, le sallanî paş raperrîni cemawerîy oktoberî sallî 1917da, bolşevîzm wek djeşorrş le têkişkandini komîtey karxanekan û şuray şarekan û herwezîy gundekanda serkewtinî bedestihêna, sallî 1939 le îspanya, leşkirî franko be têkişkandini mîlîtêryaney herewezîyekan gerrayewe desellat, le têkişkandini pilananey raperrîni cemawerîy rêbandanî 1979î êranda, be komekî zilhêzekan, axundekan bedesellaygeyiştin, le têkişkandini raperrîni cemawerîy azarî 1991da berey kurdistanî û layengranî emerîka serkewtînyan bedestihêna, wek debînin le têkişkanî raperrînekanî em dû salley dwayîşda [2011-2012] le wllatanî bakûrî efrîka, îslamîyekan û nasîwnalist û prro-emerîkîyekan serkewtînyan bedestihênawe û dehênin, bellam hiç kat û le hiç şwênêk şorrş newestawe û berdewame û beramber hewllekanî djeşorrş kardanewey nîşandawe û dedatewe, çunke şorrş hîwa û handerî jyaney û jyan bebê şorrş ne bûnî heye û ne detwanêt drêjey hebêt!

Şorrş wek allogorrî komellayeti û gorrani şêwazî rêkxistinî abûrî û kotayî serwerî çinayeti û çêkirdni komellgey azadî û yeksan û dadperwer, le hiç yek lew cêyaneda, ke raperrînekanyan be "şorrş" nawdebrên, serkewtinî yekcarekî bedestihênawe û berdewam le hellkişan û dakşan da buwe û heye. Bellam hiç kat newestawe û hiç katîş xudî şorrş têknaşkêt, bellku ewey têkdeşkêt, tenya rûda û hellçûnêkî xêray nêw rewî şorrş û hêze ramyarîyekani nêw rewî rûdawekanin. Her boye katêk ke împratorî bolşevîkî paş 70 sall têkdeşkêt, derkewtnewey xêray şepolekanî şorrş hem lewê û lem le derewey ew berçawtir debin û xebat peredesênêtewe !

Ewey ke ew waje û destewajane [hellpey ramyarîy, raperrîni û şorrş] be helle bekardebrên û cêgorrkêyan pêdekrêt, le nahuşyarî ême û lêzanî dujimnaneweye, taweku lew rêgewe le awez û huşyarîy êmeda quflî le rewî şorrş bden. Katêk ke koyle le djî koylayeti radeperretî û le têkişkanîda corî serwerî degîrrêt û ew serwerîyey xoy dekate berhemî raperrîni koylan û morî kotayî şorrş lêdedat û xoyşî dekate dwaamancî çewsawan. Her awa katêk ke le ewrupada raperrîni cutyaran û krêkarani şariy têkdeşkêt û komellêkî dîke [dewlletmendekan] cêgey serwerekanî pêşû (fiodallekan) degirnewe û bedesellatgeyiştîni xoyan dekene amancî bedîhatûy raperrîni "şorrşî" cutyaran. Eme destawdestkirdni desellate le destî fiodallekanewe bo destî borcwakanî şar. Katêk ke krêkaran û serbazan le rusyey radeperretî û le têkişkanî herewezîyekan û şura û komîtey karxanekanda bolşevîkekan desellatî qereqûşyaneyan despênin û eme dekene kotayî mêjû û berhemî şorrşî prrollitarya û her bew nawewe serkutî hemû raperrînewe û yaxîbûnêkî prrollîtêrî deken, ewe têkişkanî raperrîni çewsawane be serkewtinî djeşorrş. Bem core zincîrey têkişkanekan berdewam benawî şorrşewe debne serkutgerî şorrşî çewsawan û ew naumêdiye berhemdehênenêt, ke lem rojgareda beser mrovayîda zallbuwe; bewatayekî dîke katêk dellêyn "raperrîni" têkişkawe, wate têkişkanî hewllêk le kat û şwên û bar û doxêkî dyarîkrawda, hiç kat eme le awez û hoşî takî çewsaweda nabête naumêdkerî, lewey ke beyanî ya le şwênêkî dîke û bar û doxêkî dîkeda, egerî serkewtinî heye. Bellam katêk ke blîeyn "şorrş" têkişkawe, le hoş û awezî takî yaxî têkişkawda ew puçgerayyey berhemdehênenêt, ke serkewtinî "modêlî bîsmarkî" lelayen bolşevîkekanewe le rusyey dekate serencamî "şorrş" û dwatir têkişkanî heman modîl le sallî 1989da dekate berhemhênerî pûçgerayyekî dîke; "şorrş her ewe bû, ke azadî serkutdekrîd, şorrş ruxa wkotayîhat û îdî bo hemîşe sermayedarî dwa qonaxî mêjuwe" !

Beboçûnî min, katî ewe hatuwe, ke be wiryayyewe destewajekan bekarberîn û wajey drust le şwênî guncawda bekarberîn. "Şorrş" brîtiye le xebatî huşyaraney berdewam bo kotayîhênan be çewsanewey mrov û ajell û têkdanî jînke lelayen mrove huşyare drrindekanewe. Em xewne bebê lenêwbirdni payekani ragirtni çewsanewe; serwerî, darayî taybet, karîkrêgirte, mşexorîy, esteme bbête ketwar. Lêwe detwanîni sernicî ew rûdawane bdeyn, ke le mêjûda be "şorrş" nawbrwan û debrên. Aya ew çwar taybetmendîyey sistemî çinayetiyan lenêwbirduwe?

Beboçûnî min nexêr û le radîkallîrînyanda, ke raperrîni oktoberî 1917 bû, nek netwanra her çwar payekey sistemî çinayeti lenêwbibrên, bellku her çwaryan

lew sîstemeda manewe û amadeyyan hebû û behêztir kran; partî komunîst serwer bû, dewlet daray amrazekanî berhemhênan û zemîn û samanî komellge bû, krêkaran krêgirtey dewlet bûn, seranî part û dewlet mşexorî rencî berhemhêneranî komellge bûn.

Boçî enarşîstekan hemîşe pena bo tundutîjî debên û xebatî çîneyetî û cemawerî retdekenewe ?

Bedaxewe zorbey birryarekanî takî goşkraw be perwerdey partîyî, le pêşdawerîyewe serçawedegrin; "madam awa bawe û awa dellên, îdî awaye. Min awam bîstuwe". "Hemuwan awa dellên" ...tid. Berrêzm, min le destewajekanî toda ewendey pêşdawerîyî û hejmûnî mîdyay desellat debînim, ewende serincderîyî û pirsyar nabînim. Min nazanim zorbey ewaney ke enarkistekan be tundutîjî û wêranger debînin, çî serçawe û bellgeyek ya dîtnêkî xudîyan lew dîmenane heyê, ke wênayandeken?

Bepêçewanewey pagende bawekanewe, yekem pêkdadanekan bew core nîn, ke kamêray masmîdya nişanyandeden. Lem barewe detwanîn sernicî ew filme dokumênterî û kurte film û wênane bdeyn, ke destey hewallnêrî xopîşanderan le xopîşandaneke deyangrin û le torre komellayetîyekan û le mîdyay serbexo [www.indymedia.org] deyanxene rû, hêrişkerî yekem hêzekanî desellatin, ke pelamarî xopîşanderan deden û ewey le nişanderî kanallekanewe nişandedrêt, kardaneweyê be rûy tundutîjî desellatda, bo nmûne sernicî her dû dîwî rûdawekan ewey mîdyay desellat û ewey mîdyay djedesellat le syatil û gutîbêrg û gênêva û ..tid deyxenerrû, bden.

Paşan bepêçewaney ewey ke le dû seda sallî raburdûda lemerr enarkîyekan gutrawe û pagendey bêbnemayan bo krawe, bepêçewaney ewanewe, ke bawerryan be têkoşanî ramyarîyî û partayetî û hellpey parlemanî û rêkxistinî quçkeyaney rêkixrawe cemawerîyekan heyê, enarkîyekan tenya yek şêwaz le têkoşan be sengerî çîneyetî dezanin, ewîş xebatî cemawerîyî û rêkxistinî naquçkeyîyî bzûtnewe komellayetîyekanê, ke rêkxistinêkî weha têkoşanî natundutîjî dexwazêt, çunke rêkixraw û rêkxistnekanî ew bzûtnewane, pêkhatyê mîlîşyayî nîn û pêwîstîyan be plan û bernamey piştperdey partayetî û destey têror û toqêner nîye. Dekrêt le bzûtneweyekî cîhangirda le xorhellatewe bo xorawa, le başûrewê bo bakûr, çendîn grupî pêkhatû le lawa nî xwêngerm û bêzêzmûn hebin, ke pêkdadan letek polîs û damirkanewey satekî tûrreyî kellekebûy sallaneyan beramber dezge serkutgerekanî polîs û bodîgardekan, ke rojane sûukayetî û tundutîjî beramber take jêrdestekan denwênin û bekardeben, be karêkî şorrîşgêrane û sûdmend bzanin. Bellam serpay mêjûy bzûtnewey enarkîstî tijyetî le bzûtnewey komellayetîyî û bîryaran û tîrorî natundutîjî, lewane detwanîn nawî mahatma gandî [Mahatma Gandhi] û klara wîşman [Clara Wichman] û tolistoy û çendîni dîke berîn.

Paşan, mebest le xebatî çîneyetî çîye, aya hewll û çenebazîy parlemanî, xebatî çîneyetîyê? Aya wajokokirdnewe û parranewe le desellat û berey hawbeş letek parte ramyarîyekan, xebatî çîneyetîyê? Aya pêkhênanî rêkixrawey quçkeyî, ke kemayetîyek tyayanda bo zorîne birryardeden, rêkxistinî çîneyetîyê? Aya cullanewe û xopîşadan le çwarçêwêy yasa û çawdêrî û serperşitî hêzekanî dewlet û berizkirdnewey lafitey spî û druşmî şerimno kaney neteweyî û niştmanî û tawanbarkirdnî desellatdaran bewey ke neyantwanîwe neteweperwer û niştmanparêzbin, xebatî dje-sermayedarîyî çewsawane?

Bedaxewe, lem barewe, soşyalîstekanî kurd û nawçeke lelayek serçawey bellge û birryardanekeyan nişanderî telefzyonekanyane û lelayekî dîkewe hênde be xebatî serbexoy cemawerîyî û komellayetî namobûn, ke her bzûtneweyek lejêr fermanî seranî partekan nebêt û hewsarî desellat le mîlîda nebêt, be ajawe û tundutîjî dezanin, eme le katêkda hîç dezge û rêkxistinêkî quçkeyî çî le desellatda û çî le derewey desellat bûnî nîye, ke rojane tundetîjîyî beramber endamanî û kesanî jêrdestey bekarnebat. Hellbete mebest le tundutîjîyî, tenya tundutîjîyî cestayî nîye, bellku ferman û fşar û tengetawkirdnî derûnî û tîrorî hoşîyî û kesayetîş degrêtewe, ke le hemû dezgeyekî çîneyetîda bekardebrêt û bnemay karkirdin û manewey pêkdehênêt. Bellam leberewey ke le hoşîyî takî jêrdesteda weha refîtar û bekarbirdnêk rewayetî pêdrawe û wek beşêk le kultûr û şêwazî bîrkirdnewe û cîhanbînîyî gîştî cêgîrkrawe, kesanî nahuşyar û xoşbawerr be pagende û yasanî serwerîyî, naderbestane û destemoyane paşrewîyî lêdeken û hîç kardaneweyekî serbexo nişannaden, le beramberda katêk ke debînin, kesêk beramber polîs kutek berizdekatewe ya berdêk degrête camxaney bankêk, îdî tûşî naaramîyî debêt û twananî xwêndnewey ewey nîye, ke ewey ew lew sateda kamêrakan boy degwazinnewe, tenya kardaneweyekî sruştîyî katî hellçûn û parêzgarîyî lexokirdnî xopîşanderane !

Ew hemuwe ball û liq û popaney ke benawî enarşîsmewe hen, meger nişaney siktarîstîbûn nîn, ey çîn ?

Sereta pêwîste ddan bew ketwareda bnêm, ke araste ya têrrwanîne enarkîstîyekan lemerr pîrse komellayetîyekan berew ball û likgerîyî çûn, emeş lejêr karayî paşekşêyî paş têkişkanî raperrînekan û cenge cîhanîyekan û karayî dananî destegerîyî markîsîstî buwe, betaybet rûkirdnî çepekan le enarkîzm û parastîni ferhenge partîyî û siktarîstîyekan le bar û doxî lawazîyî bzavekeda. Min be dyarîkrawî û be aşkra le wllatanî xorhellaatî nawîn, eme dyardeye debînim û zorêk lewaney waz le çep dehênin û rû le enarkîzm deken, beheman sûnetî pêşû û kardeken û têrramane enarkîstîyekan be rewî cya werdegrin û xoyan bew core rêkdexen û deykene şunasî grupekanyan. Çunke le sunetêkî awa hatûn û beasanî natwanî û herweha zemîney komellayetîyî lebarîş bo xoderbazkirdinyan lew raburduwe, le arada nîye ya zor lawaze. Leberewe lewaneyê maweyekî zorî bwêt, ta destberdarî karayî rêkixrawî ramyarîyî û pêkhatyê quçkeyî û kirdar û guftarî siktarîstî û xudînmayî ramyarîyî bbin. Her lebereweşê ke ew kesane fretir wek platformîst kardeken û lew barede hest be aramî deken.

Be boçûnî min le raburdûda hîç yek le bîrwaranî enarkîzm nehatuwe têrramanî lemerr pîrsêkî dyarîkraw wek rewtekî cyay enarkî bnasênêt. Bo nmûne êma goldman [Emma Goldman] neygutuwe jnanî hellgirî aydyay enarko-fêminîstî debêt cya le pyawan û dabrraw le têrramane enarkîstîyekanî dîke xoyan rêkxên û karbken, ya rodolf roker [Rudolf Roker] nehatuwe blîêt hellgranî aydyay enarko-sendîkalîstî be cya le hellgranî rewtekanî dîke xoyan rêkxên û herwa pîter kropotkîn û ewanî dîkeş herwa ne xoyan û ne têrranîn û tîzekanyan cya le giştîyê bîzûtnewe, nexustuwete rû.

Nexêr, aydyay enarkîstîyekan û têrramanekan tenya ellternatîvî enarkîstekan bûn le beranber hejmûn û karî çep û rastda, bewatayekî dîke e narko-sendîkalîzm şêwazî rêkxistinî rêkixrawey cemawerîy enarkîstîye, wate katêk ême rêkixrawêkî jnanman hebêt û arastey enarkîstî hebêt, xobexo xorrekxistinî le xwarewera û asoyî debêt, wate pêkhatyê quçkeyî rêkxistin û rêkixraw retdekenewe, emeş ellternatîvî enarkîstîye le bwarî rêkxistinî, ke dekate [enarkosendîkalîzm], ya eger rêkixrawêk, herewerzîyek, sendîkayekî krêkarîman hebêt, ewa enarko fêminîstekan leser bnemay xebatî hawbeş bo lenêwbirdnî hellawardnekan lew rêkixraweda, leser bnemay têrramane enarko fêminîstîyekan, djayetî hemû dûberekîyek û her hellawardinêk leser bnemay regezîy deken. Bem core herwa têrramanî enarkîzmî takgera û komunîstî û jîngeparêz û ajelldost û bwarekanî dîke tewawkerî bîzavî enarkîstî, nek ballêk û rewtekî dabrraw û xorrekxistû becyaw lewanî dîke, bellku be hemû ellternatîvekan û têrramanekanewe, bîzûtneweyekî komellayetîy frerrehend pêkdehênin [bîzûtnewey enarkîstî]. Her kat bîzavî enarkîstî bew arasteye çû, ke wek çend ballêk xebatbkat, ewa ew kate îdî tenya brîtî debêt le çend komellayekî mezhebî û sîktarîstî wek part û grupe markîsîst û lîbrall û nasîwnalîst û ayîniyekan.

Bo xwêndnewey beşî yekem, kîrte leser em besterey xwarewe bke

Beşî yekem : <http://wp.me/ppHbY-HN>

Beşî duwem : <http://wp.me/ppHbY-HY>

Beşî sêyem : <http://wp.me/ppHbY-If>

Beşî çwarem : <http://wp.me/ppHbY-IH>

Beşî pêncem : <http://wp.me/ppHbY-IK>

Beşî şeşem : <http://wp.me/ppHbY-Jb>

Beşî hewtem : <http://wp.me/ppHbY-Jm>

Beşî heştem : <http://wp.me/ppHbY-Jt>

Beşî nohem : <http://wp.me/ppHbY-JM>

Beşî dehem : <http://wp.me/ppHbY-JR>